A. BALÎ
05.03.2009

8 Ê ADARÊ ROJA JINÊN CÎHANÊ

Li cîhanê gelek rojên girîng yên ji aliyê netewan ve tên pîroz kirin hene. 8 ê Adarê jî, ji wan rojan rojek e. Her sal ew roj ji aliyê jinên cîhanê û saziyên sîvîl ve bi çalakiyan tê pîroz kirin. Li cîhanê li pir welatan hîn mafên jinan binpê dibin! Dema li welatên serbixwe û azad mafên jinan binpê bibin, tê wê watê ku li Kurdistanê rewşa jinên Kurd hîn jî xirabtir e! Ji bo ku Kurdistan hatiye dagir kirin. Mafê Kurdan bi darê zorê ji destê wan hatiye standin. Hemî Kurd ji mafên mirovatiyê û netewiytiyê bêpar mayîne. Netewa Kurd ji aliyê perwerdeya netewî de paşda maye û di aliyê aborî û teknîkê de jî, pir şunda hatiyê hîştin. Netewa Kurd di her alî de, di nav rewşek xirab de ye. Di nav ev civata Kurd ya bi zanîn û bi dekûdolabên dagirkeran paşda hatin hîştî de, rewşa jinên Kurd hîn jî, ji ya mirovên dîn xirabtir e!..
Li Kurdistana Bakur mafê Kurdan ji aliyê dewleta Tirk ve naye nasîn. Dewleta Tirkiyê ji xwe dewletek ne demokratîk e. Mafê karker û gundiyên Tirk jî, her roj binpê dibe. Lê li gor Tirkên mafê wan binpê dibe, mafê Kurdan ya binpê dibe, ew çend qatan ji ya Tirkên zahmetkêş zêdetir e! Dema dewleta Tirk, netewa Kurd nas neke, ziman û çanda Kurdan jî, ew nasnakin û wê didizin, hemî dikin malê xwe.
Li Bakurê Kurdistanê Kurd bi zimanê xwe perwerde nabin. Bi zimanê Tirkî perwerde bûn jî, ji Kurdan re zehmet e. Ji bo vê pir Kurd bêxwende dimînin. Jimara Kurdên nikanin bixwînin û binivîsînin zêdeye. Ew jimara nexwendeyan di nav jinên Kurd de hîn jî zêdetir e!.. Ew jî, tê wê watê ku jinên Kurd, ji xeynî nexwendinê, piraniya wan nikanin zimanê Tirkî jî biaxivin! Dema bi hezaran gundên Kurdan hatin şewitandin, gundiyên Kurd koçî bajaran kirin. Di nav bajarên Tirkan de, jinên Kurd yên bê xwendin û bê ziman îro jî pir tên pelixîn!..
Bes mirovên Kurd yên sade û feqîr tenê li metropolên Tirkiyê nên pelixandin! Her welatparêzê Kurd îro ji pelixandin û çewisandina Tirkan nesîbê xwe digire. Heya wekîlên Kurd di parlamena Tirkiyê de bi Kurdî nikaribin navê xwe bêjin û bişteqilin, jinên Kurd ku yên qet Tirkî nizanin, ew di nav bajarên Tirkiyê de ma yê çi karî bikin? Di mercên wusa de mirov nikane li ser mafê jinên Kurd qise bike. Sedema her zilm û têdaya li ser jinên Kurd dibe, para Tirkan jî tê de heye û gelek e! Dema kar nebe, xwarin û vexwarin jî nabe! Rewşa jinên Kurd yên karker û zahmetkêş di nav jiyanek wusa kambax de têk diçe...
Jinên Kurd di nav jiyana rojane de, heroj ew bi kul û derd in. Lê dîsa jî, bi ew derdên giran berxwe didin, ku di nav ew civata tevlihev de li metrepolên rojavayê Tirkiyê bi serbilindiya xwe bijîn. Di aliyê dîn de, di nav bajar û gundên Kurdistanê de jî, rewşa jinên Kurd ne baş e!. Hêvîya jinên Kurd, ji Hikumata Herêma Kurdistanê ne ew bû, ku zagonek pirjinî derxînin, mêrek bi çend jinan ve tev bizewice! Pêncî sal e, ku şoreşa Kurdistanê her berdewam dike. Bi hezaran şehîdên jin jî, di rêya azadiya Kurdistanê de fîda bûn. Lê mafê jinên Kurd, Kurd bi xwe wek dagirkeran, wê nikanin binpê bikin!.. Li Kurdistanê bi hezaran jin birçî û tazî ne. Heqê mêrên Kurd didin wan, jin jê ne razî ne!..
Ew her alî de fîdakar in! Jinên Kurd li ser kar, ew wek şêr in! Di şerên li dijî dijminan de pêşmerge û fîdayî ne. Karê nav malê, ew hemî li ser milên jinan e. Gelo di aliyê mafên mirovan de, jin ji bo çi ewqas bê par dimînin? Ma di sedsala bîstûyekan de, mafên jinên Kurd ewqas binpê kirin, ji jinên Kurd re rewa ye?!.
Di ew roja jinên cîhanê de, hemî saziyên sîvîl û demokratîk yên cîhanî bi hevra dibêjin: „Mafê jinan pîroz e! Kes nikane mafê jinan binpê bike!“ Jinên Kurd jî, hêdî ew mafên jinên cîhanê bi dest xwe xistin, ew dixwazin. Jinên Kurd naxwazin bi peran bêne firotin, bê dil bêne berdel kirin! Jinên Kurd naxwazin xwe bişewitînin û an jî, ji bo çi ew ji aliyê malbetê ve tên şewitandin?..

Di rojên li pêş me de, hêviya hemî Kurdên welathez ew e, ku zagona pirjinî, ji holê rabe. Li welatek azad de, ne kêm û ne jî zêde, mêr û jin wek hev bijîn! Wek gotina mezinên Kurd gotî:“Şêr, şêr e, çi jin e, çi mêr e!“
8 ê Adarê Roja Jinên Cîhanê, çi li Kurdistanê, çi li seranserê cîhanê di nav ew mercên dijwar de be jî, bila li jinan pîroz be!..

JINÊN KURDAN

Di dîrokê de pişt mêriya jinan
Qet ew naye bîrkirin tu caran,
Wek şêran, di şerê tek û tek de...
Jinên Kurdan, xwediyê dozan!

Çi wext destpêkirye, ew zû de ye,
Pirtûka wan ya azadiyê wusa ye!
Qedera eniya wan, di stranande
Her tim tarî û reşgirêdayî maye!..

Ewqas jî, ne hêsan e, ji prangeyan,
Ewen ku zincar mayîne ji sedsalan!
Wana biqetînin, bavêjin keda azadî!
Jin hêdî hêdî doza xwe dibin xwedî!..